**Li Tirkîyeyê du hefteyên dawîn... (1 - 15 Tebax, 2022 )**

**1ê Tebaxê, 2022**

**Ji bo mehkûmê generalê berê Çevîk Bîr ku bi nexweşiya demansê ketiye, biryara tehlîyeyê derket; ji alîyê din ve di rûniştinê de heyeta mehkemeyê zor da parlamentera berê Aysel Tugluk ku îfade bide tevî ku ew jî nexweşa demansê ye û ragirtî tê darizandin.**

Çevîk Bîr ê ku di doza 28ê Sibatê de cezayê muebetê lê hat birîn û 11 meh di girtîgehê de ma, ji ber nexweşiya demansê hat berdan. Di heman rojê de parêzera girtî Aysel Tûglûk a ku gelek caran bi hinceta nexweşiya demansê daxwaza berdana wê hat kirin, li dadgehê zor lê hat dayîn ku îfade bide.

Çevîk Bîr di Tebaxa 2021an de piştî ku hiqmê di der heq wî de dîyar bû ket girtîgehê. Di 21ê Hezîrana 2022an de sewqî Nexweşxaneya Perwerde û Lêkolînê ya Îzmîrê hat kirin û nexweşiya wî ya demansê hat teşhîskirin. Saziya Tiba Edlî lêkolîna raporê kir û diyar kir ku Çevîk Bîr ji ber nexweşiya demansê ya pêşketî "nikare bi tena serê xwe li girtîgehê bijî". Li ser vê yekê Serdozgerîya Komarê ya Îzmîrê biryara rawestandina înfaza Çevîk Bîr da.

Heman Saziya Tiba Edlî di Sibata 2021an de der barê Hevseroka berê ya Kongreya Civaka Demokratîk (DTK) û parlamentera berê ya girtî Aysel Tugluk a ku 3 caran teşhîsa “demansê” lê hatibû kirin de biryara neyînî dabû.

Dadgeha Makezagonê di 13ê Tebaxa 2022an de daxwaza parêzeran a rawestandina înfazê û tehlîyekirina Aysel Tugluka ku teşhîsa demansê lê hatiye kirin red kir.

**Ji sepanên OHALê 3yên din bi dawî bûn**

Piştî ku di sala 2018an de Rewşa Awarte (OHAL) hat rakirin, bi qanûnekê rê dan berdewamîya 3 rayeyên krîtîk ên OHALê. Niha ji wan 3 rayeyan 2 bi awayekî fermî bi dawî bû.

Ji 1ê Tebaxa 2022an ve, maweyên binçavkirinê yên ku di rewşa awarte de dibe 12 rojan, ji çar rojan derbas nabe. Ji bo îhracên kamûyê dê prosedurên dîsîplînê yên normal bên sepandin.

"Tayînkirina qeyûmên ji bo şîrketên bi rêxistina terorê re peywendîdar in" ku yek ji pêkanînên OHAL'ê ye, wê 2 salên din berdewam bike.

Sepandina “Tayînkirina qeyûman ji bo şîrketên bi rêxistina terorê re peywendîdar a ji alîyê Fona Sîgorteya mevduatên Teserûfê (TMSF)” dê du salên din berdewam bike.

Rewşa Awarte, piştî peyana darbeya 15ê Tîrmehê ya sala 2016an, hatibû îlankirin û 7 caran hatibû dirêjkirin. Bi vî awayî rewşa awarte bi giştî du salan dom kir. Di vê heyamê de 32 biryarname bi hiqmê qanûnê hatin derxistin. Bi van biryaran 125 hezar û 678 kes ji peywira giştî hatin bidûrxistin, payeya 3 hezar û 213 kesan hat daxistin, 2 hezar û 761 sazî û dezgeh hatin girtin. Bi tevayî; 131 hezar û 922 kirarîyên bergirîyê pêk hatin.

Dema rêziknameya tayînkirina qeyûman a ji alîyê TMSFyê hate derxistin, hate diyarkirin ku dê 3 salan li dar be.  Sê salê wê di 31ê Tîrmeha 2021ê de qediya. Lê hikûmetê biryar da ku demê dirêj bike. Di encama nerazîbûnên tund ên mûxalefetê de, biryar hate girtin ku pêkanînên binçavkirin û îhracê salekê û tayînkirina qeyûman a ji aliyê TMSFyê ve 3 salan dewam bike.

**3yê Tebaxê, 2022**

**Karkerên Yapı & Yapı İnşaatê  ku ji bo mafên xwe dev ji kar berdan, hatin binçavkirin.**

Karkerên Yapı&Yapı Înşaatê ku ji ber nikarin mafên xwe wergirin dest bi grevê kirine, bi hinceta 'Qedexeya Qeymeqamtiyê' hatin binçavkirin.

Karkerên  Yapı&Yapı Înşaatê li gel Sendîkayên Dev Yapı-İş û İnşaat-İşê, ji ber ku mafên karkeran ên wekî mesaîya zêde û cudahiya sîgorteyê hatine desteserkirin, di 2ê Tebaxa 2022an de dev ji kar berdan û dest bi berxwedanê kirin. Qeymeqamîya Umranîyeyê piştî ku karkeran biryara çalakiyê dan, li derdora avahiya Yapı&Yapı İnşaatê ji bo mehekê qedexeya çalakîyan îlan kiribû.

Karkerên ku di roja duyemîn a çalakiyê de hatin binçavkirin, piştî nîvro serbest hatin berdan.

Karkerên Yapı & Yapi İnşaatê di sala 2018an de jî bi sedema ku mafên wan hatine binpêkirin çalakî li dar xistibûn. Di çalakiya ku di 15ê Nîsana 2018an de dabûn destpêkirin de hema hema her roj hatin binçavkirin û berdan. Karkeran di roja 11emîn a çalakiyê de mafên xwe wergirtibûn.

**Zanîngeha Bogazîçîyê piştî fîlmên bi temaya LGBTI+yê, xebatên klûba sînemayê jî qedexe kirin**

Nacî Încî yê ku ji aliyê Serokkomar Tayyîp Erdogan ve wekî rektorê qeyûm ê Zanîngeha Bogazîçiyê hat tayînkirin, xebatên Klûba Sînemayê ya Zanîngeha Bogazîçiyê ji bo mehekê qedexe kir û lijneya rêveberiyê ya klûbê ji wezîfeyê girt.

Pêşandana fîlmên bi temaya LGBTI+yê ku dê di 18ê tîrmehê de ji aliyê Klûba Sînemayê ya Zanîngeha Bogazîçiyê ve bihata lidarxistin bê hincet hat astengkirin.

**5ê Tebaxê, 2022**

**AYM: Ne sûc e ku mirov ji rektorê qeyûm re bibêje "rektorê qeyûm"**

Dadgeha Makezagonê (AYM) cezayê disîplînê û bidûrxistina yek mehî ku li xwendekara Zanîngeha Mêrsînê Îlknur Uyanê hatiye birîn wekî binpêkirina mafî dîyar kir. Îlknur Uyan tevlî çalakîyan bûbû ku ji bo protestokirina cezayên disiplînê yên ji alîyê rektor Ahmet Çamsarî ve hatibû lidarxistin.

Îlknur Uyan beşdarî daxuyaniya çapemeniyê bû ku li Cemiyeta Rojnamegeran pêk hat. Di daxuyanîyê de lêpirsînên li xwendekarên ku Komkujiya Gara Enqereyê protestokiribûn vebûbûn hat rexnekirin.

Rektorîyê bi îdiaya ku îfadeya "Rektorê Qeyûm" ku di daxuyanîyê de cih girtîye “zirarê dide rûmetê” lêpirsîn dabû destpêkirin.

Îlknur Uyan piştî ceza lê hat birîn, di Sibata 2018an de bi daxwaza 'Rawestandina pêvajoya îdarî' serî li Dadgeha Îdarî ya Mêrsînê dabû. Lê belê 2yemîn Dadgeha Îdarî ya Mêrsînê bi biryara "Bê hiqûqî tune ye" daxwaza Uyanê red kir.

Serîlêdana îtirazê ya Îlknur Uyan ji aliyê Dadgeha Îdarî ya Herêmî ya Konyayê ve jî nehat qebûlkirin. Îlknur Uyan li ser vê yekê çû Dadgeha Makezagonî (AYM). Dadgeha Makezagonî li dû lêkolînê biryar da ku Uyan xwedî azadiya ramanê ye û bi vê cezayê, mafê wê yê perwerdeyê hatiye binpêkirin. AYMyê bi daxwaza ji holê rakirina encamên binpêkirina mafê perwerdeyê dosya ji 2emîn Dadgeha Îdarî ya Mêrsînê re şand. AYMyê her wiha biryar da ku 13 hezar û 500 TL wekî tezmînata manewî bê dayîn bo Îlknur Uyanê.

**7ê Tebaxê, 2022**

**Li Spotifyê, bi îdiaya 'heqaret li nirxên olî û serokên dewletê kiriye' lêpirsîn hat destpêkirin**

Li dijî şîrketa muzîkê ya bi navê Spotifyê lêpirsîn hat destpêkirin. Hate diyarkirin ku li ser CÎMER'ê gilî hatine kirin ku navên li lîsteyên muzîkê ku ji aliyê bikarhêneran ve hatine çêkirin "heqaretên li nirxên olî" û rayedarên dewletê" dihewîne. Li ser vê yekê jî lêpirsîn hatiye destpêkirin.

Hin ji sernavên lîsteyên guhdarîkirinê ku bûne mijara gilîkirinê ev in:

"Dengê zengila telefona Xwedê", "Yên ku Hz. Muhammed dema ku bi heştira xwe re dimeşiya lê guhdarî dikir", "Stranên ku Xwedê dema Hz. Adem ji cinetê qewirand lê guhdarî dikir", "Heger Hz. Muhammed bidîta wê li Quranê zêde bikira." Stranên ku Recep Tayyîp Erdogan dema araq vedixwar, lê guhdarî dikir", "Stranên ku Hezretî Elî dema diket pêşîya erebeyan lê guhdarî dikir", "Stranên ku Hz. Mihemed dema hilkişiyaye mîracê lê guhdarî kir", "Dema ku Xwede fêkiya qedexe ragihand, Ji ber ku Hz. Meryem li vê lîsteyê guhdarî dikir, daxuyanî nebihîst", "Di bûyera Kerbelayê de stranên ku Hz. Alî han da", "Stranên ku Hz. Elî dema xîlafet wenda kir lê guhdarî kiriye."

**9ê Tebaxê, 2022**

**Di çalakiya nobetê ya ji bo betalkirina înşaeta Sinpaşê ya li Marmarîs Kızılbukê de 15 kes hatin binçavkirin.**

Li Marmarîsê 15 çalakvanên hawirdorparêz ku dixwest Sinpaş karûbarên xwe yên înşaetê rawestînin hatin binçavkirin. Sînpaşê tevî ku ji alîyê dadgehê û şaredarîyê biryara rawestinê hatiye stendin jî xebatên înşaetê didomînin.

Şirîkatîya Razemenî yên Xeyrîmenqul Sinpaş A.Ş. li herêma Kızılkum a taxa İçmelerê ya Marmarisê ku bi ser Muglayê ve ye projeyeke bi navê Marmaris Kızılbük Resort Otel ve Devremülk" berdewam dike. Bi vê projeye ve peywendîdar di doza ku ji bo betalkirina biryara "ÇED ne hewce ye" vebûye de di meha Tîrmehê de biryar di lehê hawirdorparêzan de derket.

Şîrketê tevî biryara betalkirinê ya dadgehê karên xwe yên înşaetê didomand. Li ser vê yekê Şaredariya Marmarîsê di 7ê Tebaxa 2022an de xebatên şîrketê rawestand. Ji ber ku fîrmaya ku guh neda biryara dadgeh û şaredariyê, înşeat berdewam kir, endamên Platforma Hawirdorê ya Muglayê (MUÇEP) di 9ê Tebaxa 2022an de dest bi nobetê kirin. Lê belê polîsan 15 xwepêşander binçav kirin û birin Midûriyeta Polîsan a Navçeya Marmarîsê. Kesên hatin binçavkirin piştî muameleyan berî êvarî hatin berdan.

**Rektorîya Bogaziçiyê tevî biryara dadgehê jî têkiliya Can Candan a bi zanîngehê re qut kir**

Rêveberiya tayînkirî ya Zanîngeha Bogazîçîyê bi nivîskî ragihand ku li gel biryara dadgehê jî dema wezîfeyê ya Can Candan nehatiye dirêjkirin.

Rêvebiriya tayînkirî ya Zanîngeha Bogazîçî bi nivîskî ji akademîsyen û belgefîlmçêker Can Candan re ragihand ku dema wezîfeya wî nehatiye dirêjkirin.

Can Candan di 18ê Tîrmeha 2022an de di doza ku li dijî rektoriyê vekiribû de bi ser ket. Dadgeha Îdareyê ya 7emîn a Stenbolê biryar dabû ku mafên Candan ên şexsî û madî ku jê bêpar mabûn, tevî faîza wê lê bê vegerandin.

Pêvajoya jêdûrxistina ji kar a Can Candan di 2yê Çileya 2021an de dest pê kir ku wê demê Melih Bulu bêyî ku bi akademîsyenên Zanîngeha Bogazîçî re bê şêwirandin wekî qeyûm rektor bi Biryarnameya Serokomariyê hat tayînkirin. Xwendekar û mamosteyên Zanîngeha Bogaziçiyê ji bo ku ev biryara antîdemokratîk bê bipaşvexistin çalakî li dar xistin. Can Candan ku ji sala 2007an û vir ve li zanîngehê mamostetiyê dike, bi awayekî aktîf tevlî van çalakiyan bû.

Candan di 3ê Tebaxa 2021an de li dijî Rektoriya Zanîngeha Bogazîçiyê ji bo rawestandin û betalkirina pêvajoyê doz vekiribû. Piştî ku ev doz bi ser ket, biryara ku ji aliyê rektoriyê ve hatibû girtin, wekî tedbîr hate rawestandin û li karê xwe vegerîya.

**Biryara Dadgeha Makezagonê: Divê polîsê bersûc ê doza kuştina Ali İsmaîl Korkmaz ê ku di sala 2013an de di berxwedana Geziyê de hat lînçkirin û qetilkirin, ji nû ve bê darizandin.**

Polîs Huseyin Ergin ê ku ji qetilkirina Alî Îsmaîl Korkmaz a dema berxwedana Geziyê hat darizandin, dê careke din bê darizandin. Dadgeha Makezagonê (AYM) ku li ser serîlêdana malbata Korkmaz biryar da, bi hinceta 'qedexeya îşkenceyê hatiye binpêkirin' biryara dayîna tazmînatê jî da.

Malbata xwendekarê zanîngehê Alî Îsmaîl Korkmaz ê ku di sala 2013an de li Eskîşehîrê di pêvajoya berxwedana Geziyê de bi lêdanê hat qetilkirin serî li Dadgeha Makezagonê da. Di serîlêdanê de bal kişand ser van xalan: “Lêpirsîneke bibandor nehat meşandin”, ji ber “awayê kûştinê û qewimînên neyinî yên berî û piştî mirinê xizmên wî yên nêz ketin nav tengasî û dijwarîyan”, “mafê lidarxistina civîn û xwepêşandanan hat binpêkirin" û " qedexeya muameleya xerab hat  binpêkirin".

Dadgeha Makezagonê der barê serîlêdanê de îdîayên 'mafê jiyanê hatiye binpêkirin', 'mafê civîn û xwepêşandanan hatiye binpêkirin' û 'ji bo serîlêderan qedexeya muameleya xerab hatiye binpêkirin' bi hinceta “bêrayetîya şexsî” bi yekdengî red kir.

Dadgeha MAkezagonê biryar da ku dosye ji 3yemîn Dadgeha Cezayên Giran a Kayseriyê re bê şandin da ku polîs Huseyîn Engîn ji nû ve bê darizandin. Dîsa bi yek dengî biryar da ku 67 hezar û 500 TL tazmînatê bidin malbata Alî Îsmaîl Korkmaz.

Biryar di Rojnameya Fermî de hat weşandin.

Alî Îsmaîl Korkmaz şeva 3ê Hezîrana 2013an li kolanan ji aliyê sivîl û polîsan ve hat derbkirin. Korkmaz ê 19 salî ku 38 rojan di komayê de ma di 10ê Tîrmeha 2013an de jiyana xwe ji dest da. Di doza ku der barê qetilkirina Korkmaz de Îsmaîl Koyuncu, Ramazan Koyuncu, Muhammet Vatansever û Ebubekir Harlar ên ku hat tespîtkirin ku Korkmaz derb kirine û polîs Mevlut Saldogan hatin girtin. Polîs Şaban Gokpinar, Huseyin Engin û Yalçin Akbulut ku hat tespîtkirin ku li cihê bûyerê bûne negirtî hatin darizandin.

Biryar di rûniştina heştemîn a 21ê Çileya 2015an de hat eşkerekirin.

Ji Mewlut Saldogan re 10 sal û 10 meh, ji Yalçın Akbulut re 10 sal û ji Huseyin Engin re 7 meh û 15 roj; Ji İsmail Koyuncu, Ramazan Koyuncu, Muhammet Vatansever û Ebubekir Harlar her yekî 6 sal û 8 meh cezayê girtîgehê hat birîn. Di dozê de polîs Huseyin Engin beraat kir, lê ev biryar li Dadgeha Bilind hat betalkirin. Di encama dozê de 7 meh û 15 roj ceza li Engin hate birîn. Piştî biryara Dadgeha Makezagonê dê polîs Engin careke din bê darizandin.

**10ê Tebaxê, 2022**

**Qeymeqamtîya Burhaniyeyê destûr neda Festîvala Rockê ya Zeytinliyê**

Qeymeqamtiyê destûr neda 7emîn Festîvala Rockê ya Zeytinliyê ku ji sala 2014an ve li Taxa Burhaniyeyê ya Balikesîrê tê lidarxistin. Festîval dê di navbera 17-21ê Tebaxa 2022an de bihata lidarxistin. Qeymeqamtiya Navçeyê di bersiva xwe ya fermî ya ji bo serîlêdanan de diyar kir ku "bi armanca ewlekarî û tenduristiya gel, aşitîya gel û parastina jîngehê" destûr nadin festîvalê.

Di 7ê Tebaxa 2022an de Şaxa Balikesîrê ya Cemîyeta Belavkirina Zanistê li ser hesabê xwe yê Twîtterê bi daxuyanîyekê anî ziman ku bi sedem ku exlaqê xera dike Festîvala Rockê ya Zeytinliyê naxwazin. Di daxuyaniye de komeleyê daxwaz kir ku "bo betalkirina vê festîvalê çi hewce be bê kirin". Ev gotin jî bi ser kiribûn: "Em naxwazin ev organîzasyon li bajarê me bê lidarxistin, ji ber ku exlaqê ciwan û civaka me xirab dike, zirarê dide mal û dikanên gel ê derdorê."

Cemîyeta Belavkirina Zanistê bi nêzîkbûna xwe ya bi partiya desthilatdar AKPê re tê naskirin. Piştî betalkirina festîvalê, hat ragihandin ku ji sala 2012an û vir ve 12 milyon û 613 hezar TL ji çavkanîyên gel ji bo Cemîyetê hatiye veguhastin da ku wargehên aîdî Cemîyetê bên avakirin, tamîrkirin û xemilandin. Bi ser de jî Qeymeqam İlyas Memiş ê ku îmze avêtiye bo betalkirina festîvalê nêzî vê Cemîyetê ye.

**11ê Tebaxê, 2022**

**Muzîkjenên ku ji alîyê zabitayan ve hatin astengkirin li ber Şaredarîya Bajarê Mezin a Stenbolê (IBB) bi stranan çalakîya protestoyê li dar xist.**

Muzîkjenên ku li Taksîma Stenbolê muzîka Kurdî pêşkêş dikirin ji aliyê zabitayan ve hatin astengkirin. Muzîkjen piştî astengkirinê, li ber avahiya Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê (IBB), strana bi navê "Yar Melekê" ya Aynur Doganê got û rewş protesto kir.

**Di encama giliyên ji CÎMERê re hatin kirin de, sazgêran diyar kir ku ew neçar in Panayira Dayika Meryemê betal bikin.**

Fuara ku bi sedsalan e her sal di 15ê Tebaxê de li Gokçeadayê ji bo mirina Dayika Meryemê tê lidarxistin, îsal nayê lidarxistin. Bi sedsalan, Cejna Dayika Meryemê di 15ê Tebaxê de li giravê dihat pîrozkirin. Piştî ku piraniya nifûsa Rûman ji giravê derketin, cejn veguherî panayirekê ku her sal di 14-15 Tebaxê de ji hêla Rûmên giravî yên ji deverên cûda yên cîhanê ve tê ziyaret kirin.

Panayira ku mazuvanîya bi deh hezaran kesên ji Tirkiye û Yewnanîstanê dike, îsal dê ji aliyê Komeleya Perwerde û Çandê ya Îmrozê ve bihata lidarxistin. Di daxuyaniya ku ji teref komeleyê ve hat dayîn de hat ragihandin ku piştî giliyên ku li Navenda Ragihandinê ya Serokomariyê (CÎMER) hatin kirin wan biryara betalkirinê daye.

**15ê Tebaxê, 2022**

**Li girtîgehên Herêma Behra Reş mafên girtiyan tên binpêkirin**

Di "Rapora Girtîgehên Herêma Behra Reş" de ku ji aliyê Şaxa Wanê ya Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (ÖHD), Komîsyona Girtîgehan a Baroya Wanê û Şaxa Wanê ya Komeleya Alîkarî û Piştevaniya bi Malbatên Girtî û Hikûmxwaran re (TUHAY-DER) ve hat amadekirin, hat dîyarkirin ku di lêpirsînan de, ku li 7 girtîgehên cuda hatin kirin, binpêkirinên mafan hatin tespîtkirin:

- Di ketina girtîgehê de li girtiyan lêgerîna tazî tê kirin.

- Cezayên hucreyê bi awayekî keyfî tên sepandin.

- Kotaya pirtûkan di beşa jinan de herî zêde 7, di beşa mêrande jî 8 pirtûk in.

- Nameyên ku bi kurdî hatine nivîsandin tên astengkirin.

- Weşana bi kurdî qedexe ye.

- Dermankirina girtiyên bi COVID-19ê ketine nayê kirin.

-Temaşekirina kanala Meclis TVyê qedexe ye.

- Hem di hundirê odeyan de hem jî li cihên ku girtî lê hewa distînin kamera hene.

- Ji bo nivîngehên  29 kesî xwarin bo 10 kesan tê dayîn.

Ji aliyê Yekîtiya Ewropa
ve hatiye fînanse kirin

Hemû berpirsiyariya naveroka vê weşanê tenê li ser (h)YD, İHD û EuroMed'ê ye û dibe ku ne li gorî fikr û ramanên Yekîtiya Ewropayê be.